

Nûh





Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to this comic book as provided by United States copyright law.

Print and digital copies of this version may be freely distributed without penalty under a Creative Commons license.

Gava ku Xwedê Adem afirand, wî kir ku ew bişibe wî.
Wî ew nêr û mê afirandin.
Xwedê wan pîroz kirin û navê wan «Mirov» danî.
Gava ku Adem 130 salî bû, kurekî wî yê mîna wî çêbû û wî navê wî Şêt danî.
Kur û keçên Adem ên din jî çêbûn.
Şêt bû bavê Enoş.
Enoş bû bavê Qênan.
Qênan bû bavê Mahalalêl.
Mahalalêl bû bavê Yered.
Yered bû bavê Henox.
Henox bû bavê Metûşelah.
Henox kir ku Xwedê ji wî razî be. Wî bi wî re meşî û Xwedê ew hilkişand cînetê.

Metûşelah bû bavê Lamex.
Kurekî Lamex hebû û navê wî Nûh danî.
Lamex got: "Ewê me ji xebat û eziyeta êşdar û vê axa ku Xudan nalet kiriye, rihet bike."

Nûh bû bavê Sam, Ham û Yefet.

«Nûh» tê maneya «Rihetiyê»



Mirov li ser rûyê erdê destpê bi zêdebûnê kirin. Xwedê biryar da ku jiyana mirov negihîje zêdetirî 120 sal.



Xwedê dît ku xerabiya mirovan gelekî zêde ye û her roj meyla dilê wan tev li ser xerabiyê ye.

Xwedê got: "Ezê mirovên ku min afirandine, heywan, afirîdên ku bi erdê ve dişêlin û teyrên ezmanan ji ser rûyê erdê rakim, çimkî ez li afirandina wan poşman bûm."



Lê dilê Xudan bi Nûh xweş bû.

Serpêhatiye Nûh ev e:

Nûh mirovekî raşt û di nav nîfşê xwe de békêmahtî bû û bi Xwedê re bi dil û canê xwe çû.



Sê kurên Nûh û jinê wî hebûn – Sam, Ham û Yefet.



Xwedê ji Nûh re got...

Ezê dawîya hemû mirovan bînim, çimkî ji rûyê wan ve zordarî zêde bû. Erê, ezê tevî wan, rûyê erdê jî wêran bikim. Tu ji dara goferê gemiyekê ji xwe re çêke û di hündirê wê de odeyan çêke. Hündir û dervêyê wê qîr bike. Divê dirêjahiya wê 450, berfirehiya wê 75 û bilindiya wê 45 ling be. Banê gemiyê jî çêke û bi qasî gazekî kûlekekê jî lê veke. Derî têxe li aliyekê ji gemiyê û qatên jêrîn, navîn û jorîn çêke.

"Va ye, ezê li ser rûyê erdê tofanê rakim û hemû yên dijîn û hîlma jiyane bi wan re heye tune bikim. Wê hemû bimirin."

Lê ez soz didim te, tê bi jîna xwe, bi kurên xwe û bi bûkên xwe re di nav ewlehiyê de li gemiyê bimînin.

Xwedê ji Nûh re got...

"Ji bo ku bi te re sax
bimînin, tu ji her cureyên
jîndaran cotekî —yek nêr, yek
mê—bi xwe re bixe gemiyê. Ji
her cureyên teyran, heywan û
afirîdên ku bi erdê ve dişêlin
cotek bîne."

"Ji xwe û wan
re her cure xurek bibe nav
gemiyê û bike qût."

Nûh her tiştê ku Xwedê lê emir
kiribû bi cih anî. Piştî Xwedê ji
wan xwast ku bikevin gemiyê.

Di wê rojê de, hemû kaniyên
kûrahiya erdê derbûn û kulekên
ezmanan vebûn. Û çil roj û çih
şev baran bariya.

Tofan çil roj berdewam kir. Av gelekî zêde bû û gemî ji erdê
bilind kir. Her ku diçû av zêdetir dibû, gemî bi ser avê ket. Av
ewqas bilind bû ku hemû çiyayên di bin baskê ezmanan de
nixamtin. Av zêdetirî bişt û du lîngan bi ser çiyayan ket.

KOON

Hemû jîndarên li ser rûyê erdê helak bûn; teyr, heywanên kedi, heywanên çolê, heywanên dişêlin û hemû mirov. Hemû yên ku hilma jiyane di pozê wan de hebû, li ser rûyê erdê mirin.

Her jîndarên li ser rûyê erdê hatin rakirin. Tenê Nûh û yên bi wî re siwarê gemiyê bibûn, rizgar bûn. Av sed û pêncî rojan li ser erdê ma.

Xwedê Nûh û hemû yên bi wî re di gemiyê de bûn bi bîr anî, bi ser rûyê erdê ve ba rakir û av nizim bû.

Berî Nûh qijaka reş berde derve, gemî zêdetirî sed roj li ser erdê bû.

Bavo, ew te çima wê yekê kir?

Ji bilindahiyên ve, divê qijak bikaribe erdê ziwa bibîne. Eger ew vegere, emê bizanibin ku av hê ziwa nebûye.

Na, bavo, min xwaşt bigotiba ku ew te çima qijakekî şand? Li ba me tenê du heb hene, û eger tiştekî bi serê yê din were...

Carê bê, ezê kevokekî bişînim, çimkî li ba me heft ji wan hene...

Lê qijak tenê li ser avê vir ve û wê ve firiya.

Piştî hefteyekî...

Ew çima bira, bavo?

Te di hefteyê çûyî de qijak şand, lê ew tu tişt kifş nekir.

Erê, lê ez meraq dikim. Ez dixwazim bizanibim ku rewş li derve çawa ye. Lê, ez newêrim deriyê vekim!

Hefteyekî din...

Bavo, tu çî dibêjî, ma ne wextê derketinê ye?

Ez dizanim kê yek ji van rojan bibin.

Ez dizanim kê yek ji van rojan bibin.

Erê, bavo, rast e!
Lê binêre! Ew tiştêkî di nav nikulê xwe de aniye!!!

Pelekî zeytûna!

Pelekî zeytûna!

Nûh heft rojên din sekinî û paşê...

Ez îroj dihesêm kê kevok venegere!

Ew teyra ji xwe re cihêkî ji bo bêhnvedanê dît. Ez vê yekê dizanim!

Ez bawer dikim ku divê em hê bisekinin heta erd ji me û heywanan re rind zewa bibe. Lê-

--Lê tu xem nîne ku ew çiqas dem divê em hê bisekinin. Emê ne zêdetirî wê demê ku me gemiyê çekir bisekinin, ne wisa bavo !?

Piştî Xudan deriyê gemiyê girt, sê sed û heftê-û-şêş roj derbas bûn.



Kurno, ez bawer dikim dem hat.



Îroj emê bibînin eger erd ji me re amade ye!

Ez dizanim ku ez ji erdê re amade me!



Oh, Nûh!

Ka binêre!!!

...Rûyê erdê ziwa bû.



Piştî Xwedê got:

Tu bi jina xwe, kurên xwe û bûkên xwe re ji gemiyê derkeve.

Bi xwe re ji her cureyê
jîndaran, teyr, hewan û hemû
afîrdên dişêlîn derxe derve ku
ew li dinyayê belav bibin, zêde û
berdar bibin.





Zêde û berdar
bibin û dinyayê
dagirin.

Wê hemû heywanên
erdê, teyrên ezmanan, hemû
afirîdên dişêlin û masiyên
deryayan ji we bitîrsin û
bibîzînin.

Ew hatine
bin destê we.

Hemû afirîdên
jîndar ên dilivin,
wê bibin
xwarina we.

Wek giyayên
şîr ên ku min
dabûn we, niha ez
her tiştî didim we.

Xwîna we birije,
ezê esse li heqê
we bigerim.

Ezê heqê
we, ji her
heywanî..

û ji her mirovî,
ji yê ku xwîna
birayê xwe dirîjîne
bixwazim.

Her kesê ku xwîna
mirovan birîjîne, wê bi
destê mirovan xwîna wî bê
rijandin. Çimkî Xwedê
mirovan di sûretê xwe de
çêkir.

Lê hûn zêde û
berdar bin. Zêde bin û
li ser erdê belav bin.

Min keskesora
xwe kir nav ewran û
ewê di nav min û erdê
de bibe nîşana vê
peymanê.

Gava ku ez ewran
bînim ser erdê û keskesor di
nav ewran re derkeve, ezê
peymana ku min bi we re û bi
her cureyê jîndaran re
çêkiriye, bi bîr bînim:

Wê êdî careke
din tofan ranebe ku
jîndaran tune neke.

Her cara ku keskesor
derkeve, ezê wê bibînim û wê
peymana herheyî ya ku di nav
Xwedê û her cureyê jîdarên li
ser erdê de hatiye danîn, bibîr
bînim.



Nûh û malbeta xwe
bi karê destpêkirin.

Erdê cot kirin.

Mal ava kirin.

Lî heywanan
mîqate bûn.

Jiyana xwe ya nû
ji xwe re çêkirin.

Ew çiqas baş
e ku tiştekî di rojekî de
an di du rojan de were
ava kirin, ne wisa,
birano?


Ew çiqas
baş e ku tiştekî bê
hilkişandina çel û
pênc lîngan were
ava kirin!

Eger hûn li ser
wê bifikirin, em vî konî ji
bo eynî sedem ku me
gemiyê ava kir ava
dikin: Tenê ku em ziwa
bimînin!

Û Nûh rezekî çand.

Wî hinek şerab vexwar
û serxweş bû.

Mmm. Xweş e.
Şêrîn e.





Û malbeta Nûh mezin bû.
Kurê kurên wî jî çêbûn.



Bavo!
Kurek e! Emê
navê wî Aram
deynin!
Jina min
baş e û jin li
wê miqate
ne!



Lê min dixwast
ku tu neviyê
xwe yê pêşî
bibîn!



Aram.



Nifşekî xerab
çû, lê xerabî – an ku
Xerabiya me – hê
neçû.

Peyamekî me bi
Xwedê re heye ku Ewê
dinya ji nû ve bi tofanê
paqij neke.

Gelo wê Xwedê
bi nifşên bê re kê gunehên
xwe paqij bikin çi peyman
çêke?

Û piştî tofanê, ji van malbetan ve, eşîr û neteweyên
dinayayê li tevahiya erdê belav bûn...




Piştî tofanê, Nûh 350 sal
li dinyayê ma.



Berî tofanê, dirêjbûna jiyana mirov
ji ber du sedem ne taybet bû.

Yekem, ew nêzikê temambûna
zîkmakî ya mêr û jina pêşî bûn.



Duyem, jiyana berî tofanê mîna tavxaneyê bû, ku
holikekî avî dor li erdê dipêça, tîrêjen ronahiyê
yên nebaş ji xwe dixist û jîngeheke ji şînahî û
heywanan re peyda dikir.




Rewşa erdê piştî tofanê gelekî
cudî bû. Rûyê wê hat guhertin,
lê ax hê ji çandinê re berdîr bû.

Kurên Nûh bi ya Xwedê kirin
û erdê tev kur û keçikên xwe
bi gelek mirov tije kirin.



Nemrûd ("Serhildêr") neviçirkê Nûh bû û mezin bû ku bibe mêrxasekî li ser rûyê erdê.



Di vê demê de hemû mirov zimanekî wan a hevpar hebû.

Lê ew li şûna ku bi emirên Xwedê bikin û li seranserê erdê belav bibin, wan li deşteke biber ku bi navê Şînar an Babil dihat naskirin man û pêşde neçûn.



Ka werin em ji xwe re bajarekî ava bikin û birceke ku bigihîje ezmanan çêkin, ku nav û dengê me derkeve û em li tevahiya rûyê erdê belav nebin.

Wê Nemrûdê mezin ji me re bibe rêber.



Werin, em kelpîçan çêkin û baş bipêjin.

Ji bo avakirina vê avahiyê yê mezin, em ê di cihê kevîran de kelpîç û di cihê xercê de ji ziftê bi kar bînin.



Em ne Xwedê ku
li ser me serweriyê bike
û ne jî rêbazên kevin
ên bapîrê me yê mezin,
Nûh dixwezîn.

Wê bajarê mezin
navenda erdê be. Hemû
mirov dikarin werin li vir
ku biperizin û îbadetê
bikin.



Û wê Nemrûd
li ser me serweriyê
bike.

Ew ê bibe
serwer û
serkahnê me.

Nemrûdê
mezin.



Îcar avakirin bi vê navendê
perizandinê yê nû hat
destpêkirin.



Ew destpê bi avakirina birceke
mezin ku bigihîje ezmên kirin.

Dibe ku birceke bipêlekane hebû ku wan li wir stêran
perizandin û li şûna Afîrînerê tiştan afirandin.

Xudan daket jêr, ji bo ku bajêr û birca
ku mirovan çêdikirin bibîne.







Eger ew miletek
in ku bi tenê vê yekê
kirin, êdî tu tiştê ku
bixwazin bikin ji wan
re nabe zehmet.



Werin, em
zimanên wan
tevlîhev bikin
ku ji hev fêr
nekin.



Faire
de la place
pour d'autres
à regarder
les étoiles
dieu.


Was
sagst du
idiot?

Nu pot să
înțeleg ce
se spune!



Dev ji axavtina
wê zimanê berde –
Ka ji pêşê çavê
min here!

Ma ew çi
diqewime?! Ma
tu ji min fêr
naki?



Tenê wan ên ku bi zimanên nû
diavaxîn karîn ji hev du fêr
kiriban.

Ji ber wê, avakirina bircê hat
sekinandin. Û wek Xwedê
xwest, mirov li seranserê
erdê belav bû.



"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."



SUPERBIBLE.TV